HAWAR a nû

Hizrî - Ramyarî - Rewşenbîrî

Kombenda Kawa Bo Çanda Kurdî Derdixe

Çavdêrê Gişti

Selah Bedredîn

Desteka Nivîskara

Dr. Birahîm Mehmûd
Ebdilxaliq Sersam
Vedan Adem

Şîretkarên Nivîskara

Dr. Mihemed Ezîz Zaza
Ferde Cemîl Paşa
Foad Gemo

Derhênana Hunerî

Îsam Heîc Tahir

Çapa Eliktronî

N. Zaza

Naverok

Demoqirasîya Nû Li Rojihelata Navî	**SERGOTAR**	**112**
SERDANA SEROKÊ KURDISTANÊ BIRÊZ MESÛD BARZANÎ LI EMERÎKA Û EWRUPA	**FÛWAD SÎPAN**	**107**
Peywendiyên di navbera tevgera kurd li bakurê Kurdistanê û dewleta Tirk de	**Korê Berêz Dara Bilîk**	**101**

Çewaniya Firotina Kovara Hawar nû :
Pişkdarî jibo yek sal:
Dezgehên Hukmetê û mîrî û Sendîke (12000) Dînar
Kesan (10000) Dînar
Pişkdarî jibo Şeş Heyv:
Dezgehên Hukmetê û mîrî û Sendîke (6000) Dînar
Kesan (5000) Dînar
Jibo bêtir pêzanîn peywendiyê Bi Kombenda Kawa bo Çanda Kurdî bike

Hewlêr - Şoreş - Cada Selahedîn Tel : 2240441 - 2242843

binkeykawa@hevgirtin.net www.hevgirtin.net

sergotar

Demoqirasîya Nû Li Rojihelata Navîn

Demoqirasî wek zarav û şêweyê reftarê di navbera bijareyê û zorîneyê kevne, wek tê zanîn ji çaxên roman û bîzenta hatî ye nîyasîn û werar kirî ye heya bûye rêkeke desthelatê û sîstemeke sîyasî û civakî û çandî ji serdemê şoreşa ferensî û wesa cihê xwe girtî ye bi wêneyê xwe yê pêşkeftî heya niha li zor welatan bi taybetî li ewrupa û emerîka di çarçûvê dewleta destûr û yasa û dezgehên civakê sivîl û prensîpê cudakirina desthelatan û veguhestina desthelatê bi rêka helbijartinên azad li ser binîyatê dabînkirina azadyê di biwarên kiştî û serekî mîna azadîya bîr û baweran, hizirê, weşan û ragehandinê û parastina hemî mafên welatîbûnê li jêr sîbera yeksanyê di navbera zelam û afiretê de û bê cudayîya regezî, nejadê û rengî û peydakirina dadiwerîya civakî û wekhevîya şensî û azadîya aborî.

Pirsa bi cih anîna demoqirasyê hêşta li gelek welatan li cîhanê serast nebûye û bi taybetî li devera rojihelata navîn ko taybetîya xwe

ya stiracîk heye û Hemecorîya pêkhata xwe ya olî û neteweyî û dîsan ne çareserikirina kêşên xwe yên nişтimanî heye, her çîneke civakî dixwazê demoqirasyê li gorey berjewendiyên xwe bide nîyasîn leoma zaravên demoqirasîya burjwaz, demoqirasîya millî, demoqirasîya li ser şêweyê silamî "şûra "dîyar û peyda bûn, dîsan hindek reot hene ko dixwazin prensîpên demoqirasyê li gorey berjewendiyên taybetmendîya nişтîmanî ji ol, dabûnerît û kelitoran.

Ji despêka çerxê (21) û pişтî wearарên kûr li ser astê geridonê di biwarên teknolocîya pêzanînan û aborê de û pişтî rawesitîyana şerê sar û helweşîyana rijêmên dikitator li gelek deverên cîhanê û serwerbûna yek cemiseryê, ya ji hemîya giringtir hewildana rasta ji Aliyê bijareyên desthelatdar û derdorên wan yên hizirî û rewşenbîrî li rojava bi giştî û emerîka bi taybetî li dor dûbare lênerîn û çavxşandin di kêşên sîyaseta nêvneteweyî, aştî, şer, mafê çarenivîs bo gelan, mafên mirov, pirsên guhorîna rijêmên dikitator û berihingarîya tîrorê, em dibêjin ko ev hemî werarên me anîne bîrê bûne handerê ko daxwaza demoqirasyê li rojihelata navîn bê pêş.

Dest pêşixerî bo rêveberîya emerîka bû di pirojê guhorîna "rojihelata navîna mezin ", yazdeyê sibtembera (2001) ê palderekî bi hêzê lezkirina pênigavê bû, ewrupa bi du dilîyek e ne pêtivî da dûv, dibê jiber hevirikîya berjewendîyan bê mîna helwîstê wê yê dûr ji berjewenda gelanên deverê beramber kêşa îraqê û hindek rijêmên dikitator li rojihelata navîn sereray nêzîkbûna ewrupa ya cugrafî û karîgerîya rojevên van welatan li ser.

Navnîşanên nû bizava dîroka nû vavartine jibo pirosêsa demoqirasî û rojevên nûjen erikên dîtir tîne pêş di vê qonaxê ji jîyana gelan, di dema xwe de komela netewan bûyerên peydabûyîn ji welat û keyanên encamên helweşîyana empiratorîya Osmanlîyan bercestekirin û

pejirandin û rêkeftina Sayks-Pîko temamkir, dîsan netewên yekgirtî erikên xwe bicih anîn di destnîşankirina nicamên şerêcîhanî yê diwê di pirsa terazyên hêzên nêvneteweyê li ser astê cîhanê di biwarên aborî û leşgerî û rewşenbîrî bi rêka rêkeftinên botsdam û Tehran û yalta, niha cîhan di qonaxeke berdemîya demdemî de dijî piştî nemana alîyekî ji diwênîya cemiseryê û rawesitîyana şerê sar, devera rojihelatanavîn li ber zayîneke nûye û gelanên wê çaverêya derbasbûna sîstemekî nêvnetewî yê nû dikin li jêr merc û hokarên cîhanî û herêmkî ko bi obcektîvane encamên li hêvyê ji van werarên hatine kirin berçavkê, dîsan hewlê bidê bi rêka pêşkêşikirina hêşta qurbanîyan tenahyê û jîyaneke bextewer peydabkê, eve hemî ne dûr e belko di nav hevde ye digel komeke rastîyan di vî serdemê me yê bûye dergehê berev guhorîna demoqirasî û pêtivîya xwendineke kûr û hûr heye:

Rastîya yekê: Rolê der ve yê serekî di guhorîna demoqirasî li welatên rojihelata navîn bi gişti û yên li jêr desthelatên dikitator bi taybetî jiber egerên obcektîv mîna lawazî û nebûna opozisyona demoqirata rêkixisitî û serkeftina rijêmên dikitator di herşandina çînên navîn ku jêderên hizirên lîbiral û demoqiratin, cihê serinicê ye ko der ve yê ko evro gelanên deverê pêtivî wî ne jibo guhorînê rolekî berpirsîyaryê hebû di peydabûna van rijêmên dikitator yên li ber ruxîyanê ne niha, dîsan ji nimûnên hatine encamdan û li ber çav yogoslafîya berê, efganstan û îraq.

Rastîya diwê: Girêdana serkeftina pirosêsaguhorîna demoqirasî li welatên rojihelata navîn bi pirsa serkeftinê li ser tîrorê û bi taybetî tîrora silama sîyasî, çimkî herdu pêk ve na jîn, demoqirasî jibo tîrorê êşe û dermane di heman dem de, li vêrê jî ruçilîç fakterê der ve dîyar dibê çimkî şer dijî tîrorê xwedan nasnameke cîhanî ye û serkeftin li ser nayê kirin heger ne bi qulpeke nêvneteweyî bê.

Rastîya syê: Demoqirasî li rojihelata navîn bi cih nayê heya pirsgirêka neteweyî ya gelên bindest neyê çareserikirin û li pêşyê doza gelê kurd, felesitînîyan, emazîxan, başûrê sûdanê û yên dîtir, lewma çareserikirina pirsgirêka neteweyî hemberîya serekî ye li pêşîya demoqirasyê û ev pirsgirêk pêtivî bêtir pûytedanê ye ji Aliyê raya gişтî li rojava û navendên wê yên hizirî û rewşenbîrî ko heya niha pûytedaneke ji hejî ne dane vî babetî û her di hijmêrin ji xalên mafê welatîbûnê û ev ne rêka duriste bo çareserikirina neteweyî belku bo welatên serbixwe û civakên wan yên sivîl duriste.

Rastîya çarê: Dih salên dawiyê zengîn bûn bi ezmûnan, cihên tîrorê û tund û tûjyêbêtir bûn li welatên pêkhatî ji komeke netewan û bêtirîya wan bê behrin ji demoqirasyê mîna felesitîn, efxanstan, îraq, sûdan, cezayir û.. Hitid, bê goman dîtina çareserîyek e aştîyane bo kêşên van gelan û netewan li ser şengstê mafê çarenivîs gerentî ye bo peydakirina aştyê û demoqirasyê, dîsan van ezmûnan têgeh û prensîpên nû gagartine jibo çareserikirina pirsgirêka ko dê kevne ser millê erikên pirosêsa demoqirasî mîna prensîpê "li hevhatinê "di navbera netewan û herfandina dewleta daribdesta kevin û avakirina dewleta pêkhatî û nû, prensîpê "behrdaryê "di desthelatê û samanan de, sîstemê "fediralîyeta pêşkeftî "ko nêzîke ji konfediralîyetê mîna sûdan û Kurdistanê.

Rastîya pêncê: Beramber pirojê guhorîna demoqirasî li rojihelata navîna mezin qulpekî sêanî hevdij peydadbê "rijêmên daribdestên desthelatdar û bizavên netewepeêsên şofînst û girûpên silama sîyasî, îraç jî baştirîn nimûne yebo dîyarikirina vê qulpa reş û tarî, bi taybetî di biwarê dîyarikirina rolê rijêma sûriyê ya dikitator di pişтevanî û meşqdan û hinartina tîrorstan, dîsan gunehbarîya wê ya berê di kuştina serokê libnanê (Refîq Alherîrî) û bikaranîna tîrorê dijî gelê kurd li

sûriyê û hingavtina birîyarên civata tenahyê û xwastên civakê nêvneteweyî.

Rastîya şeşê: Herêma Kurdistana îraqê bi serikirdayetîya sîyasî û dezgehên xwe û civakê sivîl bûye parçeke pêşkeftî û karîger di pirosêsa demoqirasî li rojihelata navîn ji ber têkelbûna wê ya karîger di şerê rizgarîyayêraqê û berihingarîya tîrorê, dîsan pişkdarîya wê ya bihêz di pirosêsa sîyasî li îraqa nû û avakirina wê ya berdewam bo giringtirîn ezmûn di çareserikirina pirsgirêka neteweyî li deverê.

Ev hemî erikên bêtir di danê ser millê gelê Kurdistanê, mîna dîtina çareserîyek demoqirat û rast bo kêşên gel û netiweyên murdistanê ji Kelidan, Turikman û Aşûrîyan, çimkî eve dê carek e dî taybetmendîya gelê Kurdistanê di lêborîn û qaylbûn bi yê dî û pêkvejîyana aştîyane her ji kevin de û çerxê Selah Eldîn Eleyûbî bercistekê.

Li vêrê ezê gotina derihînerê sînemayê yê cîhanî û erebê sûrî (Mistefa Eleqad) ko li vê dawiyê bûye qurbanîyekê tîrorê li Emmanê bi bîr ênim dema jê hate pirsîn çima filmê Selah Eldîn sereray ko ew ne erebe, bersiv ewbû: Çimkî sembola lêborînê û pêkvejîyana aştîyane ye di navbera gelan de ye.

SERDANA SEROKÊ KURDISTANÊ BIRÊZ MESÛD BARZANÎ LI EMERÎKA Û EWRUPA

FÛWAD SÎPAN
(AKPINAR)

Serokê Amerîka birêz George W. Bush di 25.10.2005an de di Koşka Sipî de, di oda ku jêre "The Oval Office" dibêjin pêşwazî serokê Kurdistanê birêz Mesûd Barzanî kir. Birêz George W. Bush got "ji bo min rûmet e, ku ez serokê herêma Kurdistana Iraqê, serok Barzanî di The Oval Office de dikim mêvan

Wek tê zanîn, serokê Amerîka birêz George W. Bush serokê Kurdistanê birêz Mesûd Barzanî dawetî Washingtonê kiribû.

Di dîroka Kurdistanê de ev cara yekemîn e, ku bi navê Kurdistanê birêz Mesûd Barzanî ji aliyê serokê Amerîka ve têye pêşwazî kirin.

Hevdîtina serokê Kurdistanê birêz Mesûd Barzanî û serokê DYA George W. Bush rûpeleke nû di navbera Amerîka û Kurdistanê de vekir. Ev bûyer taybetmendiyek bi serê xwe ye û tê wateya ku Amerîka raste rast Kurdistanê qebûl dike, loma bi awayekî fermî jî bi serokê wê re hevdîtinê çê dike. Yanê çûyîna serokê Kurdistanê bi awayek fermî li

Amerîka despêka pejirandina serxwebûna Kurdistanê ye.

Jixwe hêjayî gotinê yem ku serokê Kurdistanê birêz Mesûd Barzanî di 23.09.2005an de di fetivala Duhokê de hin nîşanên van bûyeran jî dabû. Ezê hê li ser axaftina wî ya li Duhokê bisekinim. Lê dikarim bi taybetî bêjim, ku min di axaftina serok de li Duhokê ev tişt fêhm kir, ku Başûrê Kurdistanê di navbera salên 2010-2013an de welatek serbixwe ye û dê bi taybetî di destpêkê de ji aliyê Amerîka ve û paşê jî ji aliyê hemû welatan ve (ji bilî welatên nexêrxaz) bêye naskirin. Ger ez ne şaş bim, min di axaftina serok de ev tişt jî fêhm kir, ku dê tev dereng heta sala 2020an hemû perçên Kurdistanê yên din jî rizgar, azad û serbixwe bin. Ez bawer im, ku min di encamê de axaftina serok baş analîz kir û ezê ne matmayî bimînim, ku dê di demeke pir nêzîk de sînorên Kurdistanê di piratîkê de ji holê rabin. Çimkî êdî ne Tirk, ne Faris û ne jî Erebên Sûriyê dê nikaribin li pêşiya vê pêvajoyê bisekinin.

Belê em werin ser mijarê. Niha yên ku bi tayetî li ser serdana serokê Kurdistanê li Amerîka û hevdîtina bi serokê DYA birêz George W. Bush re nerazî ne Tirk in. Wezareta dewleta Tirk do (26.10.2005) ji DYA daxwaz dike, ku birêz George W. Bush bi çi rengî(sifatî) ji serok Barzanî re gotiye serokê Kurdistanê.

Çavkanî ya malpera rojnama Hurriyetê :

http://www.hurriyet.com.,
www.hurriyet.com.

De werin li belengaziya Tirkan binêrin, ku wan xwe di cîhanê de çiqas biçûk xistine û hên jî biçûk dixin. Niha kî vî mafî dide Tirkan, ku ew zimanê xwe li ser Amerîka û serokê wê dirêj bikin û ji Amerîka hêsab bixwezin.

Bi saya tekoşîn, kar û xebata bi

sebir ya Başûrê Kurdistanê, êdî Kurd di cîhanê de xwedî bi bawer û xwedî bi rol in. Kî çi dibêje bila bibêje û kî jî meselê bi kîjan alî ve dikişîne bila bikişîne. Ji bilî dewletên dêspot û dîktator yên Rojhilata Navîn ku ti kes ji wan ne bawer e û ne jî bi wan îtibar dikin, êdî her kes bi Kurdan bawer e û Kurdan ji xwe re wek hevpeymanên bi îtibar dibînin. Ev jî ji bo me hemû Kurdan serbilindî ye.

Bi pejirandina rêferandûmê li Kurdistanê û Iraqê rola Kurdistana Federal ji îro şûnde di cîhanê de di qadekî din de ye. Kurdistan êdî li gorî biryar û qanûnên Iraqê û li gorî qanûnên Navneteweyî welatekî fermî ye.

Serokê Kurdistanê birêz Mesûd Barzanî di pê serdana xwe re li DYA bi serokê Amerîka birêz George W. Bush re serdana hin welatên Ewropa jî kir. Rawestgeha serok ya yekem welatê Birîtanya, Îngilistanê bû. Serokwezîrê Îngilistanê birêz Tony Blair li Londonê li kolana ku jêre dibêjin *10 Downing Street* di avahiya xwe de pêşwazî serokê Kurdistanê birêz Mesûd Barzanî kir. Serokê Kurdistanê di pê Îngilistanê re serdana Almanya, Nemasa-Awistirya, Vatîkan û Îtaliya jî kir.

Ji bilî tiştên ku di çapemeniyê de hatine weşandin, çi dan û standin di navbera serokê Kurdistanê û rayedarên dewletên Ewropa de hatiye qisekirin em nizanin. Lê beyanên birêz Mesûd Barzanî li ser serxwebûna Kurdistanê morala me hemû Kurdan li seranserê Kurdistanê û li seranserê cîhanê zêde kir. Serok Barzanî bi daxuyaniyên xwe cesaret û hêviya gelê Kurd bilind kir. Lê li aliyê din jî tirs û xofa mezin kete dilê dijminan, ku serokê Kurdistanê wek serokê Kurdan yê fermî bi awayekî dîplomatîk hate pêşwazîkirin. Ev pêvajoya han dê her berdewam be. Êdî ti kes nikare vê çerxê şûnde vegerîne. Min serdana serok di

çapemeniya cîhanê de şopand û ezê di dawiya vê gotarê de wek nimûne hemî çavkaniyên di malperên dewletan de hatine weşandin bidim. Di cih de ye, ku hinek li ser cidahî, ferq û rola Almanya û dewletên din bisekinim.

Hûn xwendevanên hêja dê di çavkaniyan de jî bibînin, ku serokê Kurdistanê birêz Mesûd Barzanî ji aliyê serok û serokwezîrên dewletan ve li Amerîka, li Îngilistan, li Nemasa, li Vatîkan û li Îtaliya wek serokê Kurdistanê hatiye pêşwazîkirin. Lê serok Mesûd Barzanî li Almanya wek serokê Partiya Demokrata Kurdistan hate pêşwazîkirin. Ji bilî rojnameya Alman Frankfurter Allgemeine Zeitung (ew jî pir kurt) ti rojnameyên din cîh nedan serdana serokê Kurdistanê li Almanya. Wek tê zanî serokê Kurdistanê birêz Mesûd Barzanî di 04.11.2005an de hevdîtinek bi seroka Partiya Xiristiyanên Demokrat (CDU) xanima Angela Merkel re ku niha bû serokwezîra Almanya çê kir. Li gor rojnameya FAZ di vê hevdîtinê de birêz Wolfgang Schäuble jî beşdar bûye û bi taybetî li ser vegera Kurdên ku di dema Sadam de ji welat reviyane û niha li Almanya wek penaber dijîn sekinîne. Birêz Wolfgang Schäuble di hukumeta Angela Merkel de bû wezîrê hundir, loma ew jî di civînê de beşdar bûye. Jixwe vegera Kurdên penaber bi taybetî wî eleqedar dike. Bê guman mirov di xala ku li ser vegera Kurdên penaber de jî niyeta Almaniya baş fêhm dike, ku wan di siyaseta xwe de li hemberî Kurdan ti guhertin çê nekirine. Rayedarên Almaniya di vê hevdîtinê de bi birêz Mesûd Barzanî re jî wek her dem berjewendiyên xwe dane pêş.

Ez di dawiya meha 9an 2005an de li Hewlêrê di Hotela Erbîl Înternasyonal de rastî Almanekî ku navê wî Felix Neugart e hatim. Birêz Felix Neugart di girûpa lêkolîna siyasî ya Bertelsmann de

kar dike. Ewî ilmê siyasî xwendiye û zimanê Erebî jî dizane. Ewî ji min re got, ku ew ji aliyê PDK ve hatiye dawetkirin, da ku rewşa Kurdistanê nas bike. Gorî agahdariyên wî dane min dê Almaniya siyaseta xwe li hemberî başûrê Kurdistanê biguherîne. Birêz Felix Neugart di pê vegera xwe re li ser Kurdistana azad gotareke 4 rûpel nivîsandiye. Ew di gotara xwe de gellekî pesna emniyeta Kurdistanê dide. Lê mixabin, ku li ser nakokiyên Kurdan yên berê jî disekine. http://www.cap lmu.de/download/CAP-Aktuell-2005-02.pdf

(Çavkanî, malpera Bertelsmann Forschungsgruppe Politik)

Niha pirsek di cih de ye, ku gelo Almaniya dê siyaseta xwe li hemberî Kurdan biguhrîne an na? Ger biguherîne, dê awayê (şikilê) vê guhertinê çawa be? Mixabin em niha nikarin bersiva van pirsan bidin. Lê rastiyek heye, ku Almaniya dê di demên pêş de li Hewlêrê Konsolxaneyekê veke.

Ger em siyaseta Almaniya li hemberî Kurdan bi kurtayî şîrove bikin, dikarin bêjin, ku ji berê de dewleta Almaniya li hemberî Kurdan siyseteke ne di cih de, yeke ne maqûl meşandiye û hê jî ne di cih de dimeşîne. Almaniya her tim dîrekt û îndîrekt bi Kurdan re xerabiyên pir mezin kirine, çek, sîleh û jehriyên gazê bi destûra hukumetên xwe dane dijminên Kurdan û wan jî li dijî Kurdan bi kar aniye. Hêvîdar im ku dewleta Almaniya rojekê hêsabên xerabiyên xwe li hemberî Kurdan bide û telafî bike.

Wek tê zanîn, serokê Kurdistanê birêz Mesûd Barzanî di 11.11.2005an de hevdîtinek bi serokkomarê Nemsa birêz Dr. Heinz Fischer re çêkir. Hêjayî gotinê ye, ku serokkomarê Nemsa birêz Dr. Heinz Fischer dostekî Kurdan yê ji dil de ye û heyranê Melle Mistefa Barzaniyê mezin e. Beriya ku ew bibe serokkomarê

Nemsa, ew serokê Parlamena Nemsa bû. Min di meha 7an di sala 2003an de li ser Melle Mistefa Barzaniyê mezin hevpeyvîn bi gellek kesan re çê kiribû û ji wan kesan yek jî hozanê gelê Kurd birêz Şivan Perwer bû. Birêz Şivan Perwer li ser hevdîtina xwe û birêz Dr. Heinz Fischer wiha dibêje:

Ez pir dixwazim ku her Kurdek Mele Mistefa Barzaniyê mezin baş binase.

Mesela îsal min Konserek li Awistirya li Viyana di Wienbûr Theater de li gel hûnermendê wan Kurt Ostban Konserek da vekirin.

Konsera me bi destê serokê Parlamena Awistirya Dr. Heinz Fischer vebû. Beriya Konserê em çûne ziyareta wî. Wî ji min re got tu dizanî ez ji Kurdan hez dikim. Ji ber ku Kurd miletekî pir fêdakar e, ji bo dost û heval û cîranên xwe her tiştî dikin, heger nîvê wî karî ji bo xwe bikirana vê gavê dê xwedî îdareyeke pir mezin bûna. Lê ligel hemû zor û zahmetiyan ez vî miletî pîroz dikim, ku hîn li ser lingan maye û bere bere nêz 1i azadiyê dike. Lê ji bîr nekin, ku dîroka we mirovekî dayî ku ez pir heyranê wî me. Heger we ew baş fêh kiribe, him fîlozof e, him dozdar e û him jî rêberekî mezin e, ew jî MELE MISTEFA BARZANÎ ye. Dr. Heinz Fischer digot gava ez xwendevan bûm resmê(wêneyê) Mele Mistefa Barzanî tim li mala min bi dar de bû. Min ew kiribû nava qehreman û efsaneyên dinyayê.

Peywendiyên di navbera tevgera kurd li bakurê Kurdistanê û dewleta Tirk de

Korê Berêz Dara Bilîk

5 – 7- 2005

Dixwazim xêrhatina we mêhvanên berêz tevan dikim û sipaiya bingihê Kawa dikim, ji bo çalakiyên wan yên hêja û ew çalakiyên birastî bikaribi bibe alîkarek mezin ji bo pêşketina tevgera kurdî li hemû Kurdstanê dikim.

Ezê hewl bidim babetê me yê îro.

Peywendiya di navbera tevgera kurd li bakurê Kurdistanê û dewleta Tirk de bînim ziman.Lê ,berî ez vê babetê vekim, ez dixwazim bi kurtî li ser dîroka tevgera kurd li bakurê Kurdistanê rawestim da ku em baştir karibin têbigihêjin ku çima heta evro peywendî di navbera tevgera kurd û desthilatarên Tirk de pêknehatiye.

Wek hûn hemû dizanin piştî têkçûna serhildanên Agirî û Dêrsim,tevgera kurd li bakurê Kurdistanê kete nav bêdengiyeke mezin de .Ev her du serhildanên dawî di sala 1938,an de bi şêwazek hovêtî ji holê hatin rahirin!Birastî terorek bêsînor li dijî Kurdên bakurê Kurdistanê bikar anîn! Piştî wê li dora bîst salan tu deng ji Kurdên bakurê Kurdistanê derneket.Zanayên wan,rewşenbîrên wan,siyasetmedarên wan ji hemû aliyan ve bêdeng man û wek mirov axek mirî biavêje ser miletekî,ew bêdengî li Kurdistana bakur peyda bû! û bîst sal,bîst du- sê sal evê bêdengiyê berdewam kir, Lê, vegera Barzaniyê nemir ji Sovyeta kevin

bandorek mezin wek parçeyên din yên Kurdistanê, li ser zana, siyasetmedar û rewşenbîrên kurdên bakur jî kir. Hêdî hêdî lebatek ket nav kurdên bakur de û dest bi hindek çalakiyan kirin. Li hember vê pêngavê dewleta Tirk zû şiyar bû, agehdar bû. Cara yekem di encama van çalakiyên hatîn kirin de (49) zanayên kurd, welatparêzên kurd, rewşenbîrên kurd hatin girtin. Ev bûyer wek bûyear(49)an di dîroka tevgera siyasî a kudên bakur de tênaskirin.

Di sala 1960ê de derbeke leşkerî li Tirkiyê pêkhat.

û di sala 1961,ê de ganûnek esasî nû hate sazkirin. Di vê qanûnê de hinek mafên demokratîk (nisbî) ,mafên civakî hatin danîn û Tirkan jî, zû, rewşenbîrên Tirk, sendêkayên Tirk mifak erênî ji vê rewşê dîtin û di sala 1961,ê de partiya karkerên Tirk damezirandin piraniya rewşenbîrên kurd, zanayên kurd di vê partiyê de cî girtin û bawerî ew bû ku, pirsa kurd di vê partiyê de tê çareser kirin û ev partî jî ji aliyê sendêkayên karkeran ve hatibû avakirin.

Di sala 1964,an de evê partiyê beşek pirkêm di bernameya xwe de pirsa kurd anîbûn ziman. Lê, xalên zelal û eşkere di bernama wan de tune bû. Di encam de, hetan vê rojê tevgerên kurdan tunebûn . Hinek welat parêzên kurd.

Hinek rewşenbîrên kurd piştî peywendiyên wan li gel Kurdistana başûr û rojavayê Kurdistanê rehatin girêdan,hinek amadahî hatin kirin. Di sala 1965,an de li Kurdistana bakur partî Dîmokratî Kurdistan_ Tirkiye hate damezirandin. Ev,ji avakirina komarê vir ve, rêxistina siyasî a yekem bû ku li Kurdistana bakur tê sazkirin. û vê yekê jî, mirov dikare bibêje pirsa netewî ji çepêtiyê zêdetir, ji îdeolojiyê zêdetir di nava kurdan de hate belav kirin .

Bandora PDK,ê di nav ciwanên kurde jî, zû xwe nîşan da û di sala 1968,ê de, xwendevanên kurd li Sitembolê, li Enqera û piştre heta li bajarê Diyarbekir û gelek bajarên Kurdistan wek komaleyek şoreşgerî, ,andîya rohilat hate avakirin û di sala 1967,ê de van ciwanan li hemû

bajarên Kurdistanê dest bixwepêşandanên mezin kir û daxwazên kurdan û Xwepêşandanan de ,hatin ziman, xwepêşandana herî mezin jî, di sala 1968,ê de li Engerê li dar ket . Di ji bo pêşketina civaka Kurdistanê, doza nazname kurî dikirin, doza avakirina dibistanan li Kurdistanê dikirin,doza çêkirina riyan, û hatina avê,dikirin. ji ber vê çendê

Sala 1968,ê de bîst û sê kes bi tawaniya endamtiya partî Dîmokratî Kurdistan hatin girtin.

Di sala 1970,ê de careke din derbek leşkerî li Tirkiyê çêbû. Di vê derba leşkerî de, gelek, zanayên kurd, xwendevên kurd, rewşenbîrên kurd, endamên partî Dîmokratî Kudistan û gelek endamên partiya Tirkiyê, Komaleya xwendevaên Kurdistanê hatin girtin. piraniya van li Diyarbekir di dadgehên leşkerî de hatin tawanbar kirin. Lê, di nava van ciwanan de gelek gotûbêjên siyasî û îdeolojî çêbûn . Mirov dikare bibêje, ji vê bakurê Kurdistanê rengek siyasî girt. Anku, rêxistinên nû gavin din hatin avêtin .Di sala1974,an de efoyek giştî li Tirkiyê derket û ew kesên hukum girtîn derketin ji derve. Derketina van ji zîndanan, gotûbêj zêde kirin . lê, şikestina sala 1975,an ali başûrê Kurdistanê bandorek mezin li ser van gotûbêjan kir û ev yek berê rêxistinan da bingehek îdeolojî û di sala1975, an de li bakurê Kurdistanê partî û rêxistin hatin avakirin.Lê,her wextî xalek balkêş bû, li bakurê Kurdistana başûr ya partî Dîmokratî Kurdistan û Yekîtî Niştimanî esasî bû !

Di destpêka sala 1976,an de komeke din derket.Ev kom ji nav çepên Tirkan hatin û kesin kurd bûn . Anku, hin xwendevanên kurd û Tirk bi hev re ev kom pêk anîn û ev kom bi navê Apoçiyan hat nas kirin. Di sala 1978, an de ev ê komê partî îlan kir û birastî çêbûn û ketina wan gada siyasî de rwşek nû dan nawa tevgera Kurdistanê. ji ber ku tevgera kurd hemû di nava xwe yekîtî, dostanî û alîkarî hebû. Lê , piştî ev rêxistin derket,nakokî, şer û dijminayî dinawa tevgerên kurdî der ket û ev ê partiyê şerê hemûyan kir û

di encama vê yekê de bi sedan ciwanên kurd hatin kuştin ! Ev rewş heta sala 1980,ê dema hatina derba leşkerî,dewam kir. Piştî hatina vê derbê, piraniya serkirdên rên rêxistinan derketin ji derve.Hinek çûn Kurdistanê başûr,beşek çûn rojhilatê Kurdistanê. Lê, di dawî de berê hemûyan kete Suriyê.

Di wan du, sê salên li Suriyê tevegera kurd heta sala 1981ê rengek din girt. Ez baweri pştî sala 1981,ê şûn de ,hûn pêvajoyê baş dizanin. Ev babet gelekî dirêje û bi seminerek-du semîneran nayê dayîn, lewra naxwazim zêde derbasî nava vê babetê bibim. Têkiliya Tirkiyê û tevgera kurd li ser bingihê çareser kirina pirsa kurd tucara nehatiye avakirin.

Dewleta tirk tucarî hew nedaye bi tu awayî tevgera kurd re an bi partiyk

Siyasî re pirsa kurd gotûbêj bike. Lê, kurdan her demê xwestiye xwe nêzî wan bike û li gel wan dan û sitandinê bike .Lê,ev yek tucarî pêknehatiye. Raste, hevkariyek di nawbera tevgerên kurd û rêxistinên Tirkande pêk hatiye. Lê, birastî ev alîkarî jî, bi gelek zehmetiyan hatine avakirin. ji ber ku partiyên kurd dixwestin îtîrafê bi mafê kurdan bikin.Wan jî, gelek mafên piçûk, mafê însanî, mafên dîmokratîk derxistin pêş. Lê, tucarî bi awakî netewî îtîraf bi mafê kurdan nekirine.ji ber vê çendê peywendiyên bi wanre dihatin kirin temenê xwe kurtbûn. Di encam de her du aliyan ji hav sûd negirtin û nedîtin. Di vir de xala herî girîng dîtinên çepê Tirkan bo gelê kurd bû. Anku, pêvajoyên wisa hatin Kurdistana bakur, çepê Tirkan yan dîmokratên Tirkan bi rastî wek rêxistin hebûna miletê kurd gebûl nekirin .Heta tevgerên kurdan gebûl kirin jî,lê wek netew gelê kurd gebûl nekirine. Hemû bi îdeolojiya teng û galib de pirsa kurd gotûbêj kirine. Lê, sedemên dewletw Tirk peywendi bi tevgera kurd re girê nedaye, komara Tirkiye li ser bingihê înkara miletê kurd hatiye danîn. Ev bingih îdeolojiya wan ya fermî ye û bingeheke kemalîzmê ye. Li vir, dîsa çend xal hene dixwazim bibêjim, ji

ber çi dewleta Tirk xwe nêzî tevgera kurd nekiriye,yek ji wan jî,li gor wan kurd nînin û heyîna kurdan wek kurd li Tirkiyê gebûl nekirine. Du her wextî dewletê bi çavek dijminî li gelê kurdan nêriye bi vi rengî kurd nirxandine. Sê,li gor wan pirsa kurd li Tirkiyê nîne û çênebûye. Ji pirsa kurdî zêdetir wek pirsa rohilat û paşdemayî nir xandine, wek pirsek aborî nirxandine. ,ar, li gor wan tu tevgerên kurd yên çêdibin destê dewletên ji derve tê de ye. Belê, tucarî gebûl nikirine kurd ji bo mafê xwe yê mirovayeti, dîmokratîk û netewî kar bikin .Riyek tenê li cem dewleta Tirkan heye û ew jî, tenê çawa karibin kurdan bikin Tirk ! cara yekem serokê komara Tirkan yê berê Tirgot Ozal di axiftineke xwe de heyîna kurdan gebûl kir û ev gebûl kirin jî gorî Tirkan bûyerek erjeng hate pêşwazî kirin. Ji ber, ew cara yekem bû berpirsek Tirkan heyîna kurdan gebûl dike û di sala 1991ê de serok wezîrê Tirkan yê berê Silêman Demîral di axiftineke xwe de got,((em rastiya kurdan gebûl dikin !))Ji derveyî van her du daxwiyaniyan, hebûna gelê kurd nehatiye gebûl nehatiye ziman. Lê, baweriya min ew ku, êdî cîhan hatiye guhartin, dem ne ew dema berêye û ne bi kuştinê, şer û înkarkirina nasname mileteki nayê helandin, ji holê nayê rakirin. Edî em dema diyalogê ye. Kurdan her tim ji aliyê xwe de doza vê diyalogê kirin û xwestine çareserî çêbibe .û îro jî, tevgera kurd li Kurdistana bakur ji vê yekê re amadeye. Lê, eger mejiyê îdeolojiya fermî xwe biguhere gengaze ku ew diyalog destpê bike û Li gorî baweriya min ji derveyî vê rê toriyên din nînin.